# Li herêmên Rêveberiya Xweser.. genim di navbera xwestî û rewşa heyî de



**Navenda Firat ya Lêkolînan**

## Pêşgotin

Li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyayê Îsal jî, weke sala çûyî, hişkesaliyê bi hezaran hiktar ji erdên çandiniyê yên b

ejî dan ber xwe, vê yekê hişt ku gelek ji xwediyên wan erdan, erdên xwe bidin şivanan û bi nirxekî gelekî kêm, ku lêçûna çandina erdê qerebû nake, pez berdan nava erd, beriya ku mûsima çinînê jî dest pê bike. mijar li vir ranaweste, çimkî eger piştgiriya bazarên cîhanî bi genim neyê kirin, dê mûsimeke zuha û bê xêr li ber deriyan be. Helbet ev rewşa genim a likêmketinê, li bazarên cîhanî, ji ber şerê Rûsya-Ukrayîna ye û ne dûr e ku ev bandor berdewam bike. Li vir, dê gelek astengî li pêşiya pêwîstiya herêmê ya genim derkevin, ji ber ku genim madeyeke bingehîn a çêkirina nên e û di her rewşê de, li ser her sifreyekê ye.

Di encama aloziyên girêdayî peydakirina ardê firneyan ji jêderine xwecihî de, ku li herêmê – weke her herêmeke Sûriyayê- rû dabû, Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyayê ardê garis tevlî ardê genim kir, ew jî, ji bo dabînkirina xwestek û pêdiviyên xelkê ji madeya nên re. Bê guman hişkesaliya îsal jî dê gelek zehemtiyan di milê dabînkirina pêdiviya firneyan ji ard re bi xwe re bîne, her wiha dê karînên kirînê jî li herêmên Rêveberiya Xweser li kêmê bikeve, û bandorê li egera jinûve-çandina erd di mûsima sala bê de jî bike.

## Pirsgirêka Lêkolînê

Herêmên Rêvberiya Xweser bi rêjeyeke bilind di çandina genim de xwe dispêrin ava baranê, lewra kêmbarîna baranê du salan li ser hev, hişt ku hilberandin dakeve astekeke gelekî kêm û di çarçoveya erdên evî de bimîne, ku rûbera wan a çandiniyê jî kêm e, îcarê li vir em dikarin pirsgirêka lêkolînê bi du pirsan destnîşan bikin:

- Di nava vê rewşa hişkesalî û nebûna plansaziyên çandinî û embarkirinê yên hevgirtî de, gelo ti planên alternatîf ji bo dabînkirina pêwîstiya herêmê ji genimê ardê nên re, li cem Rêveberiya Xweser hene?
- Di wextekî de ku buhayê genim li cîhanê bilind dibe, gelo Rêveberiya Xweser dê karîbe piştgiriyê bide nên, tevî ku ji rewşa heyî xuya ye dê berê xwe bide hawirdeyê?

## Girîngiya Lêkolînê û Armancên wê

Eger em herdu mûsimên çûyî bidin ber salên borî, em dê bibînin ku rêjeya hilberandina genim li herêmên Rêveberiya Xweser li kêmê ketiye, û êdî herêm bi xeteriya nepeydabûna qasên pêwîst ji genimê taybet bi ardê nên re rûbirû bûye.

Ha girîngiya lêkolînê li vê derê ye, ji ber ku dê balê bikişîne ser rewşa heyî ya mûsimê genim û pêwîstiya embarkirina wê, ew jî bi armanca

dabînkirina ardê firneyan, her wiha dosyayên piştgirî û destekdayînê û pirsgirêkên girêdayî wan ên li pêşiya Rêveberiya Xweser.

Armanca vê lêkolînê, nasîna pirsgirêkên herî girîng ên ku dibin sedema bipaşketina mûsima çandiniyê ye, ev sedemên ku aloziya dabînkirina pêwsitiya herêmê ji genim bi xwe re tînin. Li rex wê jî, nasîna derfet û karînên li ber dest, ên başkirina mûsima çandiniyê, û herî dawî jî pêşkêşkirina hin pêşinyarên pêwîst û girîng.

## Rêbaza Lêkolînê

Di vê lêkolînê de, rêbaza şayesî (wesfî) ji bo zelakirina rewşa heyî ya hilberandina genim hatiye bikaranîn, ew jî ji bo destnîşankirina pirsgirêk û astegniyan û gotûbêjkirina pêwîstiya herêmê ji genim re, pê re jî heta em digihin hin encamên ku pêşinyarinan bi xwe re tînin, da ku armancên ku em dixwazin di paşerojê de bi dest bixin, destnîşan bikin.

## Naveroka Lêkolînê:

### Rêvekirin

1- **Mûsimên çandiniyê paşdeçûyî ne û karvedanên aloziyê serdestên rewşê ne.**
2- **Pirsgirêk û astengiyên herî girîng li pêşiya çandina genimê demsalî.**
3- **Genim.. di navbera lêçûn û girîngiya destekdayînê.**
4- **Girîngiya embarkirina genim.**
5- **Dosyayên xistinabazarê yên genim û pirsgirêkên wê.**
6- **Dumahî: Çi tê xwestin?**

## Rêvekirin

Li cem hemû hikûmetên cîhanê, ji mijarên herî metirsîdar, dosyayên ewlehiya xwarinê ne û ji ber bandorên xwe yên li ser dosyayên mafên mirovan ên peydakirina xwarinê, xwedî cihekî gelekî girîng in. Lewra em dibînin ku hemû hikûmet hewla dabînkirina ewlehiya xwarinê ji welatiyên xwe re, bi taybet ên girêdayî berhemên çandiniyê yên stratejîk, dikin, û xwe dispêrin çavkaniyên xwe yên xwecihî, û heta ji wan tê, xwe dûrî çavkanî û destwerdanên derveyî dikin. Di encamê de xwe ji metirsiyên ji hêla aborî û siyasî yên xwespartina li aliyên derveyî diparêzin.

Herêmên bakur û rojhilatê Sûriyayê, nemaze herêma Cizîrê, bi cureyên genim ên kualîteya baş û peyda tên nasîn, ev genimê ku heta beriya aloziya sala 2011`an dikarîbûn pêdiviyên sûriyan bi cih bînin. Tevî bandorên neyînî yên aloziyê li aliyê çandiniyê bi giştî, hîna jî ev herêm çavkaniya bingehîn a genim li welêt e, û weke madeyeke sereke di pêjan nên û hin berhmên din ên hevîrî weke makerûn, piskewîtan tê nasîn. Ev yeka han dihêle ku di serî de girîngî bi çandiniyê bê dayîn û bi taybet hilberandin û çandina genim û zêdekirina rûbera embarkirina wê, bi armanca cîbicîkirina siyaseta xwetêrkirinê li herêmê û dabînkirina ewlehiya xwarinî ji xelkê re.

## Yek- Mûsimên çandiniyê paşdeçûyî ne û karvedanên aloziyê serdestên rewşê ne

Li ser asta xwecihî û cîhanî, genim berhema herî stratejîk e û cihê xwe di her pirseke girêdayî ewlehiya xwarinî li cîhanê digire, çimkî madeya sereke di pêjana nên û çêkirina hin tiştên din de ye.

Herêmên bakur û rojhilatê Sûriyayê, ji herêmên herî zêde li Sûriyayê ku genim peyda dikirin. Hilberandina wê beriya aloziyê 60% ji pêdiviya welêt a genim dabîn dikir (derdora 2.5 milyon ton salane), lê aloziyê bandora xwe li her aliyên aborî li welêt kir, di nav de jî aliyê çandiniyê û gelek zerer li binesaziyê kir û rûberên berfireh ên çandiniyê xerab kirin an jî şewitandin, li nik vê yekê, bi hezaran cotkar, ji ber rûbirûbûnên

leşkerî ku di navbera aliyên şer de li ser erdê çêdibûn, dev ji erd û gundên xwe berdan.

Di wextekî de ku Sûriyayê, beriya 2011`an, bêhtirî 4 milyon ton salane di rûbereke nêzî 1.6 milyon hiktarî de (bi rêya bikaranîna siyaseta destekdayîna berhmên stratejîk ku heta destpêka bûyeran xwetêrkirin li dar bû) hildiberand, di salên şer de, hilberandina genim gelekî berûpaş vegeriya û lêçûna hilberandinê bilind bû, û di sala 2017`an de tenê nêzî 850 hezar tonî bû, di 2018`an de hindekî bilind bû û xwe li 1.2 tonî xist, ev jî li gorî rêxistina FAW a xwarinê. Di encamê de êdî çendiya xwestî ji genim li kêmê ket, ku salane 2.5 milyon ton dida.

Di mûsima 2019`an de, agir bi gelek zeviyên herêmên bakur û rojhilatê Sûriyayê ket, ku derdora 70 şewatî zêdetirî 2500 hiktar da ber xwe. Wê demê, Rêveberiya Xweser 200 milyon dolar ji bo kirîna genim veqetandibû, lê qasa ku hat wergirtin derdora 900 hezar tonî bû, ev yek li gel zehmetiyên xistinabazarê û rikberiya bi hikûmeta sûrî re, di derbarê wergirtina berhemê de.

Di mûsima sala 2021`an de, hişkesaliyê li derdora 300 hezar hiktar ji rûberên çandiniyê yên herêma Rêveberiya Xweser xist û piraniya wan ji çarçoveya berhemdayînê derketin û hilberandin berûpaş vegeriya, ku ew jî tenê derdora 210 hezar hiktarî bû. Li aliyekî din qasa ku navendên girêdayî Rêveberiya Xweser wergirtin kêm bû û tenê 185 hezar ton ji genim bû, anku hilberandin kêmî nîvê ya sala beriya xwe bû (2020), ku di wê salê de derdora 600 hezar ton bû. Li gora tişta me gotî, êdî diyar dibe bê çiqasî hilberandina genim salane berûpaş vediger, pê re jî, karvedanên li ser ewlehiya xwarinî, nemaze peydakirina nanê welatiyan, bi xwe re tîne.

Di mûsima îsal de, gelek cotkar ji ber tirsa ji guhertinên rewşa avûhewayê, kêmbarîna baranê û hişkesaliyê, her wiha buhabûna lêçûna çandiniyê, xisitnabazarê û deraseyan berê xwe ji çandina genimê bejî guhert. Bi rastî jî wisa çêbû, çimkî yê ku çandiniya wî bejî bû, di pirrên caran de bibin diket, ji ber vê yekê ne gengaz e ku hilberandina herêmên Rêveberiya Xweser îsal 500 hezar tonî -di rewşên herî baş de- derbas

bike, ev jî, ji ber jinavçûna erdên bejî û mayîna tenê derdora 100 hezar hiktar ji erdên avî yên genim.

## Du-Pirsgirêk û astengiyên li pêşiya çandina genimê demsalî

Mûsimên bêxêr (lawaz) ên encama kêmbarîna baranê li herêmê, êdî bûn sedemeke sereke ya kêmpeydabûna berhema genimê pêwîst (derdora 550 hezar ton salane). Lê em nikarin wê weke sedemeke tekane bibînin, lewra ji astengiyên ku li pêşiya proseya başkirina mûsimên çandiniyê li herêmên Rêveberiya Xweser derdikevin ev in:

- Zêde-xwesipartina li ser ava baranê û zêdebûna rûbera erdên bejî li hember ên avî, her wiha guhertinên avûhewayî û hişkesaliya li herêmê, ev hemû dihêlin ku cotkar berê xwe ji çandina genim bidin çandina berhemên din, ku pêwîstiya wan a gelek bi baranê tune ye.
- Lawaziya birêvebirina saxlem a çavkanî û aliyên çandiniyê bi awayekî giştî, û nebûna stratejiyeke zelal û xwedî-armanc a mûsima çandiniyê, her wekî destnîşankirina pêdiviyên bicihanîna wan armancan.
- Nepeydabûn û buhabûna kelûpelên hilberînê ji tov, semad û dermanên çandiniyê, her wiha aloziyên sotemeniyê ku bûne derdek li cem cotkaran, bi taybet cotkarên xwedî bîrên taybet, ên ku mîtorên avê li ser mazotê dixebitin.
- Nebûna projeyên çandiniyê yên pêşketî, û pêşkêş-nekirina desteka pêwîst ji bo bikaranîna rêbazên modern di avdanê de, di wextekî de ku rêjeya ava binerd ji ber gelek sedeman, wekî rewşên avûhewa û nebûna baranê, berûpaş vedigere.
- Qutkirina ava çemên Dicle û Firatê bi rêjeyeke mezin ji aliyê Tirkiyeyê ve, ku weke siyaseteke şer li dijî Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyayê bi kar tîne. Ew jî bi armanca ku bandorekê li hilberîna çandiniyê bike û astengiyan li pêşiya berhemên stratejîk derxe. Çimkî Enqerayê para Sûriyayê ji çemê Firatê gelekî kêm kir (200 metre kab di yek çirkeyê de), bi vê yekê hemû rêkeftinên navdewletî yên girêdayî meseleyê binpê kirin,

nemaze "Rêkeftina sala 1987`an" ku li gorî wê rêkeftinê, gerek e para Sûriyayê 500 metre kab di çirkeyekê de be.

- Peyda-nekirina cureyên nû yên tovên genim ji aliyê Rêveberiya Xweser ve li navendên lêkolînên çandiniyê, bi armanca başkirina makzayî –wekî çawa berê dihat kirin- û tenê bikaranîna cureyên heyî, ku dibe mercên avûhewayê yên dema niha bi wan re neguncin, di encamê de hilberîna genim berûpaş vedigere.
- Meseleya destekdayîna çandinîyê, bi taybet meseleya sotemeniyê, ku barê darayî yê Rêveberiya Xweser girantir dike û di encamê de para cotkaran ji sotemeniyê tê kêmkirin û proseyên avdanê di mûsim de gelek caran dixeniqe.
- Belavbûna nexweşiyan di nava zeviyên genim de, bi taybet nexweşiya "Kumikê Zer", li gel kêmpeydabûna dermanên çandiniyê, nebûna semadê û dereng-destwerdana aliyên berpirs ji meseleyê re.
- Zehmetkêşiya di meseleya peydakirina tov, bi nirx û kualîteyeke guncav, ew jî ji ber ku Saziya Zêdekirina Tov a bi ser Rêveberiya Xweser ve qasa têrker ji tovê pêwîst bi kualîte û nirxekî baş ji cotkaran re dabîn nekir, evê yekê hişt ku gelek cotkar beşekî ji mûsimê xwe yê sala borî embar bikin û di sala piştre bikin tov. Yan jî berê xwe bidin sûkên bazirganiyê ku nirxê tov li wan pirr buha ye û nayê zanîn ka kualîteya wî tovî baş e yan na! ev yek dihêle ku mûsimên bên lawaz bin û lêçûnên hilberînê li ser cotkaran zêdetir bibin.
- Rikberiya di navbera Rêvberiya Xweser û navendên hikûmeta Sûriyayê de di derbarê meseleyên kirîn û wergirtina berhema genim ji cotkaran de, û biryarên ku azadiya tevgera cotkar sînordar dikin, ku pirrê caran dihêlin ev cotkar rastî keysbaziya bazirganên mezin bên, ev bazirganên ku azadiyeke mezin a tevgerê bi dest dixin û berhemê (genim) bi nirxekî kêm dikirin, lê hemwextî vê yekê, hêsankariya xistinabazarê û rêkarên mezaxatina kirînnameyê (serfkirina fatoreyan) û tiştên girêdayî wan, peyda dike.
- Rêveberiya Xweser di mijara dabînkirina tov xwe naspêre rêkarên pratîk û pêwîst, lewra  navendên lêkolînên çandiniyê bi xwe gerek e koka tovên resen biparêze û cureyên ku bergiriya wan li dijî

nexweşiyên berbelav û guhertinên avûhewa û germahiyê heye, hilberînin. Li aliyekî din -li gorî pisporên çandiniyê- "tenê cureyek di çandiniyê de tê bikaranîn, qasa vî cureyî li gorî tê xwestin tê zêdekirin û tenê li cem hin cotkarên cihê baweriyê tê çandin".

## Sê- Genim di navbera lêçûn û girîngiya destekdayînê

Bê guman, peydabûna çavkaniyên aborî ji pirsên herî girîng in ji bo pêkanîna weberhênanê ye, ku ew jî (weberhênan) hewcedarê birêveberiyeke saxlem e, da ku çavakniyan bi awayekî guncav û baş bixebitîne.

Li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyayê gelek derfet hene ku bihêlin berhemên girîng, pêwîst û stratejîk peyda bibin. Her wiha ji her kesî re belî ye ku Rêveberiya Xweser dikar pêwîstiyên xelkê ji kelûpel û berhemên sereke yên çandiniyê, bi taybet genim, peyda bike.

Ji hêla erdnîgariyê ve, rûbera çandiniyê li herêmê berfireh e (derdora 1.2 milyon hiktarî), her wiha çemên Dicle û Firatê[1] jî di nava erdên bakur û rojhilatê Sûriyayê ve diherikin, ev yek dihêle ku rûbera erdên avdayî zêdetir be, li gel peydabûna petrolê, ku hêmana sereke ya her çalakiyeke aborî ya geşpêdanê ye, her çawa bi rêya wê (petrol) sotemeniya ji proseya çandiniyê re pêwîst û xistinabazara wê peyda dike.

Lê îroroj derfet ji her demî bêhtir heye, çimkî birêveberiya Amerîkayê ev herêm ji cezayên "Qanûna Qeyser" bidûr xistin, îcarê niha derfet e ku xebat ji bo cîbicîanîna projeyên çandiniyê û bipêşvebirina rewşa çandiniyê li herêmê bên kirin, her wiha rêbazên modern ên avdanê bên bikaranîn, kargehên semadê yên modern bên avakirin, li rex wê jî kargehek ji bo peydakirina dermanên çandiniyê.

Buhabûna lêçûnên hilberîna çandiniyê- bi taybet genim- derdê herî girîng e li cem cotkar û rêncberên herêmê, nemaze ku pirraniya wan xwe dispêrin ava baranê û rêjeya rûberên avdayî ji tevaya rûberên

[1] Hêjayî gotinê ye, ku Tirkiye ava van herdu çeman weke şerekî taybet li dijî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyayê, bi armanca cîbicîanîna ajendeyên xwe yên siyasî û leşker, bi kar tîne.

çandiniyê 25% derbas nake, îcarê hêvî tenê bi baranê ve  tên girêdan, ew jî ji bo lêçûnên hilberînê bên dabînkirin û ev yek jî li ser rewşa hişkesaliya ku herêm tê re derbas dibe, bi awayekî yekser, dimîne.

Nirxê kelûpelên hilberînê, zêdeyî duqatan, ji nirxê xwe yê berê buha bûye, her wiha ji ber hişkesalî û qutbûna ava çeman, bi taybet çemê Dicleyê ku gelek gund di avdana zeviyên xwe de, xwe dispêrinê, hiştin ku hilberîn gelekî lawaz be. Her wiha kêmpeydabûna tovên baş, buhabûna nirxê wan û nirxê semad û dermanên nexweşiyên giyayan –eger hatin peydakirin jî- barê cotkaran gelekî giran kirine, ev ji bilî buhabûna nirxê sotemeniyê û parçeyên çakirinê yên ku hiştin nirxê çinîn, cot, tov û barkirinê jî buha bibe.. ev hemû dihêlin ku çandinî bi awayekî giştî ber bi paş ve vegere, bi taybet genim; ku hêmana herî girîng e.

Li vê derê, em dikarin behsa mijareke din a girîng bikin, ew jî ast, qas û cureyê desteka ku desthilatên Rêveberiya Xweser pêşkêş dike, ev mijara ku bareke gelekî giran ê pereyan diavêje ser milê gencîneya giştî ya Rêveberiya Xweser, çimkî bi karîn û derfetên Rêveberiyê re nagunce.

Lê tevî wê yekê jî, û di mûsima îsal de, Rêveberiya Xweser -weke destek- sotemenî (mazot) bi nirxekî baş û qaseke mezin a tov pêşkêşî erdên avdayî (zêdetirî 100 hezar hiktar) kir, her wekî genim.

Bi her halî, em nikarin behsa aliyê çandiniyê bikin; bêyî ku behsa girîngiya pêşkêşkirina desteka pêwîst jê re bikin! çimkî mesele ne tenê di çarçoveya hejmarkariya darayî û bazirganiyê de digere, lê belê mesele bi peydakirina ewlehiya xwarinî û xwe-nespartina li ser derve di mijara peydakirina nanê welatiyan de, ve jî girêdayî ye, ev ji bilî hemû metirsiyên aborî, civakî û siyasî yên ku dê bi xwe re bîne.

Pêşkêşkirina destekê bi rêbaz û vekolîn ji qonaxa başkirina tovan bi awayekî zanistî û di navendên taybet de dest pê dike, her wiha pêşkêşkirina tov bi nirxekî guncav û dabînkirina semad, derman û sotemeniyê û hêsankirina proseyên xistinabazarê heta ku berhem bê wergirtin. Hemwextî wê, divê siyaseta sazkirina projeyên çandiniyê yên navîn û piçûk ji bo xurtkirina bingehên geşpêdanê li herêmê bên

meşandin, ev yek dê bihêle ku cotkar dest ji erdê xwe bernede û proseyên çandina berhemên stratejîk, nemaze genim, bidomîne. Çimkî nedestekdayîna bi cotkar re di van rewşên zehmet de (mûsimên ku ji nav diçin), dê bihêlin ku ew cotkar berê xwe ji çandina genim bidin çandina berhemine din, eger dest ji çandiniyê tevî jî bernede! Ji ber ku ev rêze-bibinketinên ku cotkar rastî wan tê, zererê digihînin rewşa wî ya darayî û karînên wî yên berdewakirina çandiniyê zihîf dikin.

## Çar- Girîngiya embarkirina genim

Hişkesaliya ku ev du sal in li herêmê çêdibe, hişt ku qasa hilberîna genim berûpaş vegere. Tevî desteka ku Rêveberiya Xweser li gel hink piştgirî ji aliyê hikûmeta sûrî ve tê pêşkêşkirin, lê ev herêm –weke hemû herêmên Sûriyayê- gelek caran rastî aloziyeke ard û nên hat, pê re nirxê "nanê Siyahî" jî ku aliyek ji xwestekên li ser nên dadigirt, buha bû. Helbet ev yek li nebûna siyasetên embarkirinê, çandinî û hilberînê vedigere. Di encamê de herêm rastî alozîne metirsîdar dibe, bi taybet kêmpeydabûna nên; ku bi awayekî giştî, hêmaneke sereke li ser sifreya sûrî ye.

Li gel ku Rêveberiya Xweser di mûsimên 2019 û 2020`î de derdora 1.5 ton genim wergirtibû, lê dîsa jî di destpêka sala 2021`an de aloziya ard xwe da der, û gelek firne ji ber buhabûna nirxan û kêmpeydabûna ard rawestiyan. Vê yekê hişt ku Rêveberiya Xweser nirxê "nanê Siyahî" bike 1200 lîreyên sûrî û paşê jî kir 1500 L.S.

Her wiha nirxê nanê kualîtebaş "Med`ûm" ji 250 L.S kire 300 L.S. Niha jî li bazarên Rêveberiya Xweser zehmetiya peydakirina ard heye, ew jî piştî ku rêjeyeke bilind a li embarên wê xelas bû, evê yekê hişt ku biçe ardê garis li nav yê genim bixe (20%), da ku nên çêbike.

Ev xalên me li jor gotî, bê guman ji me re destnîşan dikin ku divê siyaseteke embarkirinê ya hevtemamkirî li ser esasê lêkolînên aborî, hejmara embarên pêwîst û dirêjahiya dema embarkirinê li gorî pêwîstiyên ewlehiya xwarinî û dabînkirina xwetêrkirinê li herêmê bê

danîn. Ev hemû, da ku herêm arastî şantajên siyasî yên derveyî nebe, bi taybet ku em ard bi rêya herêma Kurdistanê ji Tirkiyeyê hawirde dikin, îcarê ne gengaz e ku em biryara xwe ya ewlehiya xwarinî bikin destê rejîma tirkî.

## Pênc- Dosyayên xistinabazarê yên genim û pirsgirêkên wê

Rikberiya di navbera saziyên Rêveberiya Xweser ên taybet bi wergirtina genim, û saziyên bi ser hikûmeta sûrî ve ji her kesî re xuyayî ye. Her aliyek dixwaze hanedana firotinê bi rêya bilindkirina nrixê genim bike. Rêveberiya Xweser nirxê yek kîlo genim bi 2200 L.S destnîşan kir –eger em bidin ber nirxên cîhanî, nirxekî bilind e- her wiha saziyên giştî yên bazirganiyê yên hikûmeta sûrî yek kîlo bi 2100 L.S destnîşan kir. Li aliyekî din, Rêveberiya Xweser biryara qedexekirina guhestin û firotina genim di navbera herêmên girêdayî xwe de derxist, û diyar kir ku eger ev biryar bê binpêkirin, dê cezayên mezin bi xwe re bîne.

Tişta ku em dixwazin li vir bibêjin ew ku qasa tê pêşbînkirin ji hilberîn û radestkirina genim ji aliyê cotkaran ve, dê têra pêwîstiya herêmê ji genim (550 hezar ton) neke. Gerek bû, li şûna wê biryarê, çareseriyên hevtemamkirî ji bo meseleya çandinî, xistinabazarê û hilberîna genim bên lêkolînkirin, da ku handana hilberîn û radestkirina bo saziyên Rêveberiya Xweser li cem cotkaran çêbibe.

Wekî mînak, Rêveberiya Xweser dikarîbû meseleya pêşkêşkirina sotemeniyê -bi nirxekî baş- bi sozên cotkaran ên radestkirina berhemên xwe ji kompanyayên geşpêdana çandinîyê yên Rêveberiya Xweser ve girê bide. Her wiha lêkolînkirina meseleya başkirin û bipêşxistina tov, peydakirina cureyên baş yên bi rewşa avûhewayê ya herêmê re diguncin. Li rex wê jî gerek e rêjeya rûberên çandiniyê yên genimê terî û hişk bên destnîşankirin, ew jî li gorî pêwîstiya herêmê. Ji ber ku yê terî di çêkirin nên de tê bikaranîn, ku Rêveberiya Xweser bi xwe derdê kêmpeyfabûna wê dikêşe.

## Di dawiyê de çi tê xwestin?

Hîna jî her çalakiyeke aborî yan jî yeke hilberînê ji bin siya bandora ne-aramiya ewlekarî û siyasî derneketiye, û rewşa (pevketina aborî) êdî nema tê veşartin. Lewra pirraniya ewlehiya xwarinî li Sûriyayê rastî xeteriyê tê û rêjeya kesên pêdiviya wan bi xwarinê heye her roj zêdetir dibe, ew jî ji ber gelek sedeman; her wekî sedemên aborî û hin jî ewlehî û siyasî ne.

Ji ber vê yekê, gerek e em li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyayê- ev herêmên berfireh û nangir- gelekî guh bidin meseleyên çandiniyê û bi taybet çandina genim û ceh, ku berhemên stratejîk in û ewlehiya xwarinî dabîn dikin û xwetêrkirinê bicih tînin. Di vê derbarê de em dikarin van pêşinyaran bikin:

- Divê kesên berpirsê aliyê çandiniyê plansaziyeke hevtemamkirî û armancên ku xwtêrkirinê li herêmê bi xwe re tîne deynin, bi taybet ji bo berhema genim.
- Divê xebatên çandiniyê û bi taybet ên genim, ji bo armancên xwestî di pênc salên li pêşiya me de bên kirin, ev yek ji bo danîna plansaziyeke çandiniyê ya hevtemamkirî, her wekî başkirina tov, destnîşankirina siyasetên aborî, ku bi rêya wan ew armancên me gotî pêk tên.
- Destnîşankirina pêwîstiya herêmê ji genim, ew jî bi rêya destnîşankirina rûberên ku divê bên çandin (li gorî pêwîstiya bi genimê avî û yê bejî), li nik wê jî, destnîşankirina rûbera embarkirinê û dirêjahiya dema wê, li gorî pêwîstiya herêmê û heta ji me bê em ne genim û ne jî ard, ji derve hawirde nekin.
- Pêşkêşkirina desteka pêwîst di meseleya çandina genim de, ji tov û semadê bigire heta di sotemenî, xistinabazarê û wergirtinê ve derkeve, lê ev destekdayîn gerek e bi rêkûpêk û lêkolînkirî be.
- Gerek e xebatên ku li navendên lêkolînên zanistî yên bi ser Rêveberiya Xweser ve bên başkirin û bipêşxistin, ew jî da ku cureyên tovên baş, ne nexweş, xwedî hiberîneke bilind û li gorî rewşa avûhewaya herêmê bên peydakirin, ev ji aliyekî ve. Lê ji aliyekî din ve gerek e nexweşiyên zeviyan bên vedîtin û dermanên

guncav ji wan re bên destnîşankirin. Ev bi xwe têra hilberîna cureyên nû yên genim û bi kualîte û berhemdayîneke baş dike.

- Hevkariya li gel hejmareke ji cotkaran li gorî karnameyên çandiniyê û bi mercine ku ji cotkaran re cihê handanê bin, da ku tovên başkirî yên ku ji aliyê navendên zêdekirina tov di nava erdên wan de bên çandin, ev jî ji bo zêdekirina hilberîna wî tovî di salên bê de.
- Sazkirina projeyên piçûk û navîn ku rêjeya hilberînê bilindtir bikin û aramiyê ji cotkar û malbatên wan re peyda bikin, li rex wê jî, sazkirina projeyên pîşeyî yên girêdayî hilberîna çandiniyê, yan jî ku berhma çandiniyê ji wan re (ji projeyên pîşeyî re) hêmana sereke be, ev yek dê bihêle ku jiyana cotkaran xweş bibe û pereyên pêwîst ên ji bo jinûve-hilberînê û bipêşxistina wê peyda bibin.
- Destnîşankirina buhayê genim weke berhemeke stratejîk û hêmaneke bingehîn a ewlehiya xwarinî li herêmê, pê re jî, bidûrketina ji hisabxwestin û bazirganiya di mijara destnîşankirina nirxê genim de. Çimkî bandora vê meseleyê li ser rewşa heyî ya hilberînê ji aliyekî ve û li ser rewşa heyî ya jiyanê ji aliyekî din ve heye.
- Bicihanîna projeyên ku xwe dispêrin awayê avdana modern, bi taybet avadana genim û girîngdîtina wê û dabînkirina hemû alav û pêwîstiyên wê, bi nirxekî baş û li gorî deyndayîneke bê fêde, ku fikkirna deyîn bi mûsimê çandiniyê ve bê girêdan, ev yek bi armanca bilindkirina asta hilberîna erd, zêdekirina hilberînê û dabînkirina pêwîstiya herêmê ji genim.
- Sûdgirtina ji bidûrxstina herêmê ji cezayên "Qanûna Qeyser"; ew jî bi rêya daxwaza destek û hevkariyê ji saziyên çandiniyê yên navdewletî, nemaze rêxistina Neteweyên Yekbûyî "FAW" a taybet bi xwarin û çandiniyê, da ku xebat ji bo projeyên başkirin û bipêşxistina çandiniyê û jinûve-avakirina binesaziya saxlem bên kirin, bi vê yekê dê xwetêrkirin û bilindkirina asta hilberîna çandiniyê li herêmê pêk bên.